Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar: 510 21-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî



# Gelê Serdeştê li benda alîkariyê ye

**Li Wargeha Serdeştê bi hezaran welatiyên Êzidî yên ku ji ber zulma çeteyên DAIŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de xwe spartibûn Çiyayê Şengalê dimînin. Li wargeha Serdeştê zêdeyî 10 hezar kes lê dimînin. Lê ji ber şetên serma û zivistanê malbatên di kampê de zehmetiyan dikişînin.**

Şêniyên Wargeha Sedeştê ya li ser Çiyayê Şengalê ku zêdetirî duhezar malbat lê dimînin, di şertên zivistanê de zehmetiyan dikişînin. Meclîsa Gel a Şengalê bi derfetên xwe alîkariyê dike, lê têrî nake. Hikûmeta Iraqê jî sozên dabûn bi temamî pêk ne anîne.

Li Wargeha Serdeştê bi hezaran welatiyên Êzidî yên ku ji ber zulma çeteyên DAIŞ'ê di 3'yê Tebaxa 2014'an de xwe spartibûn Çiyayê Şengalê dimînin. Li gorî zanyariyên saziyên fermî di rewşa niha de zêdetirî 2 hezar malbat dimînin û hejmara kesên li van malbatan dimînin nêzî 10 hezarî ye.

Piştî ku gel li Wargeha Serdeştê bicîh bû, ji aliyê saziyên alîkariyê û Rêveberiya Rojavayê Kurdistanê ve çadir hatibûn dayîn û alîkariya xwirek hatibû belavkirin. Lê ev 4 sal e çadirên wan nehatine guhertin û gelekî kevin bûne.

Bi hatina demsala zivistanê re jî, şert û mercên şêniyên wargehê girantir bûne. Li aliyekê dema baran dibare rêyên wan hemû dibin herî, li aliyê din ji ber ku çadirên wan kevin in, av dikeve nava wan û malbat gelekî zehmetiyan dikişînin.

Her wiha ji ber hewayê sar ê zivistanê pirsgirêka gerimkirinê derdikeve û pêdiviya malbatan bi sotemeniyê heye.

**WELATÎ GAZINCAN DIKIN**

Şêniyên wargehê diyar dikin ku pirsgirêkên wan ên çadir û sotemeniyê heye û xwestin ku alîkariya wan bê kirin. Jina bi navê Kamil Xelef destnîşan kir ku dema baran dibare, hundirê çadira wan werî derve lê tê û dibin avê de dimîne. Kamil Xelef da zanîn ku çadirên wan hîn yên sala destpêkê ne û nehatine guhertin, lewma xwe li ber baranê nagirin, her wiha pêdiviya wan bi mazotê heye.

Kamil anî ziman ku ew bi derfetên wan pêdiviyan peyda dikin, lê derfetên wan pir kêm in û heta niha alîkariyek cidî ji wan re nehatiye.

Jina bi navê Kurtê Reşo ya 60 salî jî bibîr xist ku heta çeteyên DAIŞ'ê li herêmê bûn, gerîlayên PKK'ê ew parastine û me erka xwe pêk aniye. Kurtê Reşo got ku niha pêdiviya wan bi alîkariya hewamdin û sotemeniyê heye û wiha dom kir: "Bi taybetî dema baran pir dibare em neçar dibin ji ber lehyê malên bihêlin û derkevin. Ji ber ku av dikeva nav malên. Ez bixwe jî nexweş im, nexweşiya dil bi min re heye. Lê derfetên me nîn in ku biçin nexweşxaneyê."

**DERFETÊN ME TÊRÊ NAKE**

Têkildarî mijarê Enadmê Meclîsa



Gel a Serdeştê Xelîl Hecî da zanîn ku ew wekî meclîs bi hemû derfetên xwe û bi alîkariya saziya xizmetguzariyê di nava liv û tevgerê de ne ku alîkariya welatiyan bikin, lê derfetên wan pir kêm û têrî nakin. Lewma pêwistiyên gel bi alîkariyek hîn zêdetir heye.

**HIKÛMETÊ SOZÊN XWE BI CIH NEANÎ**

Xalîl Hecî, bibîr xist ku dema şandeyek li ser navê Şengalê di meha îlonê de çûbû Bexda, ev daxwazên gel anîn ziman û wiha dom kir: "Di hevdîtinan de daxwaz hatin pêşkêşkirin. Desteya Mafê Mirovan gelek soz dan û got ku ew ê bi taybetî di zivistanê de alîkariyê bigihînin Çiyayê Şengalê. Lê ev soza xwe hîn bicîh ne aniye."...*ROJNEWS*

# Buhaya sebze û fêkiyan li bajarê Qamişlo guncawe

**Melek DEMÎRTAŞ**

Li herêma Cizîrê bi rast hatina sala nû tevgera welatiya ya ji bo kirîna madeyên xwarinê zêdebûy, da ku gel di sala nû de bi xweşî pîroz bike hazirtiyên xwe dikin taybey jî di milê xwarin û vexwerinê ku mîna çandekê hatiye avakirin. Di rewşên wiha de bazirgan derfetê digrin û madeyên xwerinê taybet sebze û fêkî buha dikin. Da ku em buhaya sebze û fîkiyan nasbikin Rojnameya Ronahî dakete kolan û di nerînên gel girt û ev rapor amedekir.

Welatiyan diyer kirin ku tevî êrîş û ambargoya ser Bakurê Sûriyê tevgera bazar başe û hemû cureyên sebze û fêkiyan heye û bi buhayek guncawe."

**NÎRXÊN SEBZEYAN GUNCAW**

Mihemed Seyda sebze firoşe anî ziman ku li hemû cureyên sebzeyan li sûka sebzeyan hene û welatî tên hemû pêdiviyên xwe li vir dikirin û wiha got: "Bajarê Qamişlo de tevgera bazarê gelek heye, her wiha buhayên sebze û fêkiyan jî guncawin wekî moz ji 500 heya 550 sêf 200 heya 250 porteqal ji 100 heya 250. Yanî kirîn û firotin normale."

**NÎRX LÎ GORÎ REWŞÊ TÊ GUHERTÎN**

Şemsedîn Elî ji Qamişlo ye ku ev 32 salin karê firotina fêkî û sebzeyan dike anî ziman ku buhayên fekî û sebzeyan başe û wiha got: "Carna di rewşa hewayê nexweşbe şehnên ku sebze û fêkiyan tînin kêm dibe, her wiha kareke û cotkar jiber rewşa hewayê nikarin bikevin nav bexçe de wiha nirxên sebzeyan buhadibin. Wekî niha buhaya bacanên sor ji 200 heya 400 xiyar ji 200 heya 350 bacanê reş ji 300 kartol 150 heya300 şînkahî li bajêr tê çandin arzane her gurzek bi100P.S."

Şemsedîn bal kişand ser şopandina Zabîteyên Zemhêr di nav bazrê de û wiha got: "Di rewşên cejin anjî şahiyan de dewriyên zabîtê de nav bazarê de başe, lê ya girîng ku di dema piştî nîvro de dewriyên xwe zêde bikin, da ku bazirganên kêysabz derfetê ji valatiyê negrin û madeyên xwerinê buhanekin. Û wiha bi dawî kir: "Bi hêvîne ku sala nû salek armaî û kêfxwaşî be, taybet azadiya Efrîn û tevahî gelê Sûriyê be."

Fatima Mehemûd Hesen nirxên hemû cûreyên xwerinê başe û bal kişand ser rêzdayîna netewan û jiyana mûzayîk û wiha bi dawî kir: "Ya girîng ku em gelekî bêyî cudahiya ol û netew bi hevre jiyan dikin ku sala nû netenê Sûriyan em hemû pêkhate bi coş pêşwazî dikin."


**BÎ ALÎKARÎYA GEL XEBSAT HEZANTÎR DÎBE**


Rêvebera Zbîteya Zemhêr ya Xerbî Rîm Xelef ser tevger û dewreyên zabîtan di rojên cejnan de wiha got: "Di rewşên wiha de tevger û dewriyên zabîtan di nav bazarê de zêde dikin, ev dewriyna hem ji bo kontrolkirina buhayan, ewlehî û hem jî ji bo çavdêriya madeyên demburî dikin. Her wiha dema ku welatîyek ji buhaya gazinc anjî şîkayet dike; hemen dewriyek zabîteyên zemhêrê diçe cihê gezinc jê hatiye û li gorî rêzkînameya zemhêrê ew kes tê cezakirin."

Rîm Xelef da zanîn ku li gorî rewşê derweyên zbaîtan diguherê û wiha got: "Di demên asayî de ji demjimêra 8:30 heye 3:00 piştî nîvro di nav bazarê dene, lê dema ku gazin anjî rewşa cejin hebe heya danê êvarî dewam dikin. Her wiha li firinan jî dewriya di demjimêra 5 sibehê digerin, di heman demê de dewreyên zabîte taybet di nav bijîjkan de jî seyrê heye. Rîm bi bang bi dawî kir: "Ewlehî û çavdêriya bazarê erka meye ya serkeye lê, dema ku gel jî bi mere alîkar be taybet di rojên cejnan de, dê ev erek baştir û hesanîtir pêk bê."









Ronahî
şopdara rastiyê ye
www.ronahi.net/ku/ Hejmar : 510 21-Kanûn- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Gerîlayên HPG'ê li leşkerên Tirk xist

Li başûrê Kurdistanê çalakiyên gerîlayên HPG'ê li dijî artêşa Tirk ya dagirker dewam dikin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla û êrîşên dewleta Tirk daxuyanî da. HPG'ê diyar kir ku li Girê Elîdirêj ê herêma Sîdekanê ya Başûrê Kurdistanê, li dijî leşkerên Tirk çalakiyeke sekvaniyê hate kirin. Di encamê de leşkerek birîndar bû.*R-2*



# BÎRYARA DYA WÊ HÊZÊ BIDE TERORÊ

**Di demeke ku Hêzên Sûriya Demokratîk li Dêrazorê şerê li dijî DAIŞ'ê didomîne û ji aliyê din ve dewleta Tirk gefa dagirkirinê li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe, Serokê DYA'yê daxuyakirin ku ew ê hêzên xwe ji Sûriyê vekişînin. Vê biryara DYA'yê pirsên "gelo lîstik û planên nû li dijî Bakurê Sûriyê di dewrê de ne" anî bîra mirovan.**



## BIRYAR BIBE SEDEM KU DAIŞ XWE KOM BIKE

Fermandariya Giştî ya QSD'ê derbarê daxuyaniya Serokê DYA'yê de ku diyar kiribû ew ê hêzên xwe ji herêmên rizgarkirî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişîne, daxuyaniyek da. QSD'ê diyar kir ku hê şerê li dijî DAIŞ'ê berdewam dike di vê demê de biryareke wiha wê hêzê bide terorê û wê bibe sedem ku DAIŞ careke din çalakiyên terorî li herêmê pêk bîne. QSD'ê da zanîn ku ku ev biryar wê bihêle ku gelên herêmê di nava pencên hêzên dijber de bimîne. *R-5*



## EW Ê BERXWEDANA ME DEWAM BIKE

TEV-DEM'ê li ser gefên dewleta Tirk a dagirker û daxuyaniya Serokê Emerîkayê Donald Trump daxuyaniyek da. TEV-DEM'ê got, "Gelên Bakurê Sûriyê divê nîşan bidin ku îradeya neteweya demokratîk têk naçe. Bedelên wê giran be jî dema li ber xwe dan hebe ew ê jiyana bi rûmet û azad teqez bi ser bikeve." TEV-DEM'ê di daxuyaniyê de diyar kir ku divê ev biryarA DYE'yê li ser gelên mazlûm yên Bakurê Sûriyê nebe parçeyekî planên qirêj. *R-5*

## Sed hezar kes li pêş baregeha koalîsyonê kombûn





Bi sed hezaran welatiyên Bakurê Sûriyêli dijî êrîşên dewleta Tirk yên li ser herêmên wan li pêş baregeha Koalîsyona Navnetewî ya li Xerabişikê ya Kobanê civiyan. Şandeyekê bi rayedarên koalîsyonê re hevdîtin kir. Piştî hevdîtinê şandeyê daxuyaniyek da û ji Neteweyên Yekbûyî xwest ku li hemberî êrîşên dewleta Tirk berpirsyariyên xwe bi cih bîne û qada hewayî ya Bakurê Sûriyê ji balafirên şer ên dewleta Tirk re bigirin. *R-2*

## Li Til Temirê 160 kesî dest bi greva birçîbûnê kir




Çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo şikandina tecrîda li ser Rêber Ocalan berdewam dikin. Li navçeya Til Temirê 160 kesî ji bo piştgiriya parlementera HDP'ê Leyla Guven ya ku li dijî tecrîda li ser Rêber Ocalan ketiye greva birçîbûnê, kon vedan û dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Çalakî wê du rojan dewam bike.

## Armanca Tirkiyê dagirkirina Sûriyê ye




Jinên endamên partiyên siyasî yên li bajarê Helebê bertek nîşanî gef û êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê dan û diyar kirin ku serokê rêjîma Tirk Erdogan hewl dide li herêmê şerekî nû derxîne. Jinên siyasetmedar dan zanîn ku Tirkiye dixwaze beşek din axa Sûriyê dagir bike. *R-3*

## 7 hezar jin tevlî xebatê bûn



Endama Rêveberiya Aboriya Jinê ya Herêma Cizîrê Şêrîn Emîn û Endama Buroya Têkiliyên Diplomasî ya Kongreya Star Feryal Hesen xebatên xwe yên sala 2018'an nirxandin û dan zanîn ku di nava vê salê de 7 hezar jin beşdarî xebatan bûne. Her wiha dan zanîn ku xebatên avakirina kooperatîfên jinan jî hatine pêşxistin. *R-3*

## Em beriya Emerîka jî li vir bûn û me têkoşîn dikir



Hevserokê TEV-DEM'ê Xerib Hiso, der barê biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyê de axivî û diyar kir ku armanca daxuyaniya DYA hedefên siyasî ne û wiha got, "berî Emerîkayê jî li ser vê axê têkoşîn û berxwedana me hebû. Em bawer nakin DYE bi hêsanî dest ji destketiyên xwe yên li berde û here." *R-4*

## Gelên Minbicê wê herêmên xwe biparêzin



Têkildarî gef û êrîşên dagirkeriya dewleta Tirk yên li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbêcê Mihemed Xêr Şêxo diyar kir ku gelên Minbicê wê li rex hêzên xwe yên parastinê herêmên xwe li dijî êrîşan biparêzin. *R-4*

## Divê partiyên siyasî li hember êrîşan bibin yek



Sekreterê giştî yê Partiya Çepgir a Demokratîk Salih Gedo û Hevserokê Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdistanê Telal Mihemed li dijî gef û êrîşên dewleta Tirk bang li tevahî partî û tevgerên Kurdistanî kirin ku bibin xwedî helwesteke hevpar û ji bo lidarxistina kongreya netewî bikevin nava tevgerê. *R-4*

## Bila Tirkiye jî ji Sûriyê vekişe



Hevserokê HDP'ê Sezaî Temellî li ser biryara DYE ya li ser vekişîna ji Sûriyê got, "Nêrîna me zelal û eşkere ye. Bila hemû hêzên derve ji Sûriyê vekişin. Bila DYE jî vekişe, Tirkiye jî Rûsya jî vekişin. Bila gelên Sûriyê li ser paşeroja xwe biryarê bidin." Temellî diyar kir, ji bo dawî li lîstikên şer ên li Sûriyê bê anîn divê NY tavilê bicive û ji bo aştiyê helwestekê nîşan bide. *R-4*

# Sed hezar kes li pêş baregeha koalîsyonê kombûn

**Bi sed hezaran welatiyên Bakurê Sûriyêli dijî êrîşên dewleta Tirk yên li ser herêmên wan li pêş baregeha Koalîsyona Navnetewî ya li Xerabişikê ya Kobanê civiyan. Şandeyekê bi rayedarên koalîsyonê re hevdîtin kir. Piştî hevdîtinê şandeyê daxuyaniyek da.**

Gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji Koalîsyona Navnetewî xwest ku bila qedexeya hewayî bê îlan kirin û hêza aştiyê li herêmê bi cih bibe.
Sed hezaran welatiyên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li dijî êrîşên dewleta Tirk û bêdengiya navnetewî ya li dijî êrîşan berê xwe dan baregeha Koalîsyona Navneteweyî ya li gundê Xerabişikê yê li başûrê rojhilatê Kobanê.
Şandeyeke şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi reyadarên Koalîsyona Navneteweyî re li baregeha Xerabişikê ya li kantona Kobanê civiya û daxwaz kir ku Neteweyên Yekbûyî li herêmê bi cih bibe û êrîşên dagirkeriya Tirk ên li ser axa wan rawestînin.
Hat gotin ku, şandeyê ji rayedarên koalîsyonê xwestiye ku helwesta xwe li hember gefên Tirkiyê nîşan bidin, her wiha endamê şandeyê nameyek tê de daxwaza gelên herêmê nîşan dide, radestî rayedarên koalîsyonê kir ku ji serokê Amerîkayê Donald Trump re bişînin.
Piştî ku şandeyê bi reyadarên koalîsyonê re hevdîtin kir daxuyaniyek da.
Di daxuyaniyê de bang li Neteweyên Yekbûyî hat kirin ku li hemberî êrîşan berpirsyariyên xwe bi cih bîne û qada hewayî ya Bakurê Sûriyê ji balafirên şer ên dewleta Tirk re bigirin, êrîşên dagirkerên Tirk ên li ser axa Bakurê Sûriyê rawestînin".




## DAIŞ, hîn bi dawî nebû ye



Wezîkarê Karê Derve yê Elmanya yê Heiko Maas, bertek nîşanî daxuyaniya Serokê DYA'ê Donald Trump a ku got "DAIŞ li Sûriyê li bin ket" da û biryara vekişandina DYA'yê ji Sûriyê rexne kir.
Piştî daxuyaniya serokê DYE'yê Donald Trump ya vekişîna ji Sûriyê bertek û rexneyê debartê vê biryarê de zêde dibin. Piştî Îngiltere û Fransa yê niha Elmanya jî bertek nîşanî biryara vekişîna DYA'ê da.
Wezîrê Karê Derve yê Elmanya yê Heiko Maas diyar kir ku raste DAIŞ lewaz bû, lê hîn tehdîd ji holê ranebûye û wiha got: "Wê encama vê biryarê zirarê bide tekoşîna li dijî DAIŞ'ê û serkeftinên ku hatine bi destxistin dixe bin xeteriyê."

# Li Til Temirê 160 kesî dest bi greva birçîbûnê kir

Bi pêşengtiya Kongreya Star û Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) li Til Temirê çalakiya konê gireva birçîbûnê hat destpêkirin.
Bi armanca şermezarkirina tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, her wiha piştgiriya Perlemantera HDP'ê Leyla Guven, Kongreya Star û PYD'ê bi dirûşma "Tecrîdê bişkînin, faşîzmê têk bibin û bi Rêber Apo re azad bijîn" Li navçeya Til Temirê çalakiya greva birçîbûnê da destpêkirin.
Kon bi wêneyên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, ala Kongreya Star û PYD'ê hat xemilandin. Di nav de 86 jin 160 kes ketin greva birçîbûnê. Her wiha Desteya Jinên Enternasyonalîst a Ewropayê jî tevlî çalakiyê bûn. Endama Koordînasyona Kongreya Star a Kantona Hesekê Şukriya Mihemed di çalakiyê de axivî û wiha got: "Em berxwedana Leyla Guven silav dikin. Lewra sekna jina azad nîşan dide di heman demê de tecrîdkirina Rêber Apo şermezar dikin, bi vîna jina azad em ê komplo û hemû planên li dijî gelê Kurd vala derbixin û azad bijîn. Bi hêza şervanan û şehîdên azadiyê şoreşa Rojavayê Kurdistanê heta vê kêliyê didome. Em ê bi hêz û îradeya xwe li ser lingên xwe bisekinin."
Çalakî wê 2 rojan bidome. Di nava 2 rojan de wê serdana kon bê kirin û sinevizyon bê temaşekirin.



# Em ji Sûriyê dernakevin



Wezîrê Fransayê yê ji karên Ewrupayê berpirsyar Jean-Yves Le Drian diyar kir ku leşkerên wan ji bo niha ji Sûriyê dernakevin.

Wezîra Parastinê yê Fransayê Florence Parly bertek nîşanî daxuyaniya Serokê DYA Donald Trump da. Parly li ser hesabê xwe yê tweetirê bersiv da daxuyaniya Trupm a "Li Sûriyê DAIŞ bi dawî bû'.
Parly diyar kir ku ev demeke ku DAIŞ tucar evqas lewaz nebûye û wiha got: "Lê ne DAIŞ ji xerîtê derket ne jî koka wan hat qelandin. Divê ev rêxistina terorê, di nava axa ku mayî di destê wan de ji aliyê leşkerî ve bê tune kirin."
Wezîrê Fransayê yê ji karên Ewrupayê berpirsyar Jean-Yves Le Drian jî diyar kir ku leşkerên wan ji bo niha ji Sûriyê dernakevin.

# Gerîlayên HPG'ê li leşkerên Tirk xist


Li Girê Elîdirêj ê herêma Sîdekanê ya Başûrê Kurdistanê, li dijî leşkerên Tirk çalakiyeke sekvaniyê hate kirin. Di encamê de leşkerek birîndar bû.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê li ser çalakiyên gerîla û êrîşên dewleta Tirk daxuyanî da.
Di daxuyaniyê de ev agahî hatin dayin:
"18'ê Kanûnê saet 7'an, hêzên me li herêma Sîdekanê ya Başûrê Kurdistanê li dijî leşkerên TC ên dagirker ên li ser Girê Elîdirêj çalakiyeke sûîqestê kirin. Di encamê de leşkerekî dijmin birîndar bû. Hêzên dijmin piştî çalakiyê herêm dan ber bombeyan.



19'ê Kanûnê saet navbera 20:20-21:10'an helîkopterên bi tîpa Kobra yên artêşa TC a dagirker êrîş birin ser Girê Xerebol, Girê Saddam, Girê Şehîd Delîla û Şehîd Rustem ên herêma Zapê yên Herêmên Parastinê yên Medyyaê. Hêzên me di cih de bersiv dan û di encamê de helîkopter neçar man ji herêmê biçin."

## Karwanekî leşkerî yê Îranê ber bi Dêrazorê ve diçe

Karwanekî leşkerî yê Îranê ji derdora parêzgehên Idlib û Hemayê yên Sûriyê ber bi parêzgeha Dêrazorê ve diçe.
Li gor nûçeya ANHA'yê çavkaniyên herêmî ji parêzgeha Idlibê ragihand ku karwanekî leşkerî ku di nav de leşkerên Îranê jî hene, ji derdora parêzgehên Hema û Idlibê ber bi parêzgeha Dêrazorê ve diçin.
Çavkaniyan destnîşan kir ku karwan ji nêzî 80 erebeyên leşkerî û 400 leşkeran pêk tê. Her wiha çavkanî teqez kir ku hêzên rêjîma Sûriyê û yên Îranê hêzên xwe li aliyê rojavayê çemê Firatê li rex parêzgeha Dêrazorê kom dikin. Her wiha çavkaniyan da zanîn ku beşek ji karwanê erebeyan ji balafirgeha leşkerî ya Hemayê ber bi Dêrazorê ve çû.



# Daxwaza hevdîtina bi Ocalan re dîsa hate redkirin

Serlêdana hevdîtinê ya parêzeran a ji bo dîtina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate redkirin.
parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan Rezan Sarica, Faîk Ozgur Erol û Muhdî Oztuzun ji bo bi muwekilê xwe Ocalan re hevdîtin bikin cara 774'an serî li Serdozgeriya Komarê ya bajarê Tirkiyê Bûrsayê dan, lê serlêdana parêzeran hat redkirin.
Parêzerên Ocalan ji 27'ê Tîrmeha 2011'an û vir ve her tim bi îdîaya "muxalefeta hewayê heye" "koster xera be ye", "koster di tamîrê deye" "Rewşa Awarte" û "Rastî cezayê dîsîplînê hatiye" rastî astengiyan tên û nikarin bi muwekîlê xwe Ocalan re hevdîtin bikin.





# Pirtûka li ser dengbêjiya çiyayê Kurmênc

***Hunermend û Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Mihemed Welîd diyar kir ku faşîzma Tirk li Efrînê qirkirina çandî û guherîna demokrafîk pêk tîne û dixwaze Kurdan li Efrînê tune bike. Welîd da zanîn ku ji bo balê bikişîne li ser reseniya çanda Kurd li ser dengbêjiya Çiyayê Kurmênc pirtûkekê dinivisîne.***

**Idrîs HENAN**

Dengbêj, nivîskar û endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Mihemed Welîd derbarê denbêjiya Çiyayê Kurmênc de pirtûkekê amade dike. Li gorî Welîd wê ev pirtûk hemû derewên dewleta dagirker a Tirkiyê eşkere bike. Welîd di vê derbarê de tekz dike: Faşîzma Tirk piştî dagirkirina Efrînê hewl dide demografiya wê biguhere û koka Kurdan biqelîne. Jixwe dibêje ku herêma Efrînê ne ya Kurdan e. Mebest ji vê pirtûkê nîşandana resentiya Efrînê ye. Dîroka me bi dengbêjiyê hatiya vegotin.



### DENGBÊJÎ JÊDERA VEGOTINA DÎROKÊ YE

Mihemed Welîd di destpêka axaftina xwe de denbêjî pênase kir û got: Dengbêjî bingeha starana Kurdî ye. Naskirina rastî, dîrok, erdnîgarî, dost û dijminê Kurdan e. Jêdera vegotina dîroka resen a devkî ya Kurdan e. Girîngiya xwe ji veguhezîne serpêhateyên qehremantiya kurd digire. Li gorî baweriya Welîd: Ger ne ji denbêjiyê be wê dîroka rast a Kurdan bihata wendakirin. Welîd di nav axaftina xwe de behsa evîna Kurd jî kir û got: Dengbêjî evîna Kurd jî vegotiye. Hemû hewldanên diziya çanda Kurdan bi denbêjiyê vala derketin. Mînak; efsaneya Leyl û Mecnûn. Ereban di bin navê Qeys û Leyle de kirine mal. Her wiha Tirk û Persan jî wisa kirine.

### DENGBÊJÎ EŞQA RAST E

Mihemed Welîd derbarê pirtûka xwe de ev tişt jî got: Proje di bin sîwana Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê de bi rê ve diçe. Ji bo zindîhiştina mîrata bav û kalan, vegotina rastiya Kurd a Çiyayê Kurmênc ji nifşa bê re ev pirtûk tê amadekirin. Welîd di dirêjahiya nirxandina naveroka pirtûkê de got: Em ê dengbêjiyê ji dusêsed salan û vir de bigirin dest. Dibe ku hinek zor be em hîn paşve vegerin. Em ê ji serdema dengbêjên aşiq û derwêş ên weke Xelê Bûd, Hesen Bico, Mala Şe`irê, Hemîşê Kûrik û vir de werin. Welîd dibêje: Dema ku dengbêjekê heft rojan û hef şevan bi stranan çîrokek vedigot, ne li benda ti diravan bû. Hezkirina ji heqîqetê re hebû. Em ê di vê pirtûka xwe de cewherê denbêjiyê bi mînak û şîroveyên real bi nifşa bê re parve bikin.

### KOKÊN ME KÛR IN

Mihemed Welîd Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê destnîşan kir ku: Faşîzma Tirk hewl dide li Efrînê şopên Kurdan nehêle. Ji ber vê ketiye nava kiryarên guherîna demografîk, lîska bi dîrokê, sîlkirina hafîzeya civakî û qirkirina çandî. Li dibistanan zimanê Tirkî esas girtiye. Li ser dîwaran nîvîsên nijadperest dinivîsin. Dibêjin ev cih ware bav û kalên wan ên osmanî ye! Welîd tekez kir: Di pêvajoya parastina çandî, cografî û derûnî de çapkirina vê pirtûkê gavek girîn a têkoşîna li hemberî dagirkeriyê ye. Wê dunya zanibe ku kokên me di vê xakê de kûr in. Wê derewên Tirkiyê ku pala xwe daye diziya çandên gelan eşkere bibin. Dengbêjiya me isbat dike ku temenê Kurdaxê ji temenê hebûna Tirkan li vê herêmê mezintir e.

### EFRÎNÊ DENGBÊJIYA KURDISTANÊ PARATIYE

Her wiha Mihemed Welîd dibêje: Efrîn bi taybetmendiya xwe ya istiqrarê her çanda Kurdî parastî ye. Li kêleka xweseriya xwe, denbêjiya li herêmên dîtir ên Kurdistanê li Efrînê hatiye parastin. Mînakên wê jî bi taybetmendiya denbêjiya Efrînê re xwe dane der. Stranên nola Eyşa Îbê, Bêrîvana Cindî, Derwêş û Edûl, Memê Alan,… hwd bi dengê dengbêjên Efrînê heya roja me ya îro zindî mane.
Dengbêj, nivîskar û endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Efrînê Mihemed Welîd di dawiyê de got: Di Pêvajoya Şoreşa Rojava de çapkirina vê pirtûkê pêngavek çandî ya girîng e. Wê ji bo parastina nasnameya Efrînê ya Kurdistanî pêngavek di pêvajoya rizgarkirina Çiyayê Kurmênc de be.



## Yekemîn Festîvala Şêwekarî ya Jinan hat lidarxistin

Li bajarokê Kifrî koma Jinên Şêwekarî yên Kifrî, yekemîn Festîvala Şêwekarî ya Jinên Kurdistanê lidarxistin.
Li Hola Şehîd Atêla ya li peymangeha Hunerê ciwanan a bajarokê Kifrî ya ser bi herêma Germiyanê, Festîvala Şêwekarî ya Jinên herêma Kurdistanê hat lidarxistin. Gelek kes tevlî festîvalê bûn.
Di destpêkê de peyama Koma Jinên Kifrî hat xwendin û piştî wê daxuyaniyek di derbarê festîvalê de hat xwendin.
Komên cuda cûda derketin ser dîkê û stran gotin. Di festîvalê de 75 jin ji bajarên Silêmanî, Hewlêr, Dihok, Kerkûk, Rojhilat, Rojava û Bakurê Kurdistanê bi berhemên xwe beşdar bûn . Wê festîval 2 rojan berdewam bike…***ROJNEWS***

# Hevkariya bi pirtûkxaneya Kobanê re

Kolektîfa pirtûkfiroşên bajarê Frankfurtê ya Almanyayê, li pirtûkfiroşa bi navê "Land in Sicht (Bejahî xuya bû)" bi pirtûkxaneya Rodî û Perwîn a li Kobanê re hevkariyek da destpêkirin . Ew yekemîn pirtûkxaneya bajêr e ku piştî rizgarkirina Kobanê hat avakirin.
Di vîtrîna pirtûkfiroşeke li Frankfurtê de wêneyên gundê jinan JINWAR´ê xuya dibe, pê re jî pirtûkxaneya Rodî û Perwîn li Kobanê û pirtûkên li ser Kurdistanê tên nîşandan. Reaksiyona mişteriyên pirtûkfiroşiyê gelekî erênî ev yek nirxandiye, lê ne tenê ew; xelkê ku di ber vîtrînê re dibihûre jî li ber wê disekinin, nexasim ji ber ku xweşik hatiye xemilandin. Ji hinan îro bi xwe jî hem Şoreşa Rojava û hem jî lazimiya parastina wê, ji wan tiştan in ku bi temamî bi wan nizanin.



Gulana 2016´an li Kobanê pirtûkxaneya yekem bi navê Rodî û Perwîn hat vekirin. Ew di heman demê de mekanek e ji bo çalakiyên hunerî, nîqaş û semîneran. Bi alîkariya Rêveberiya Xweser, Cihan û Ednan Hesen heta niha bêhtirî hezar pirtûkî berhev kirine. Di nav van de roman, helbest, kurteçîrokên bi Kurdî, pirtûkên li ser dîroka Kurdî, li ser fîlozofî û sosyolojiyê jî hene.
Navê pirtûkxaneyê ji Rodî û Perwîn tê ku her du jî di êrîşa 25'ê hezîrana 2015´an de bi destê DAIŞ´ê hatibûn qetilkirin.
Cîhan û Ednan Hesen dibêjin, hîna di serdema rejîma Esad de, xewn û xeyala Rodî û Perwînê bû ku li Kobanê pirtûkxane û navendeke çandê ya kurdî hebe. Lê belê ji ber ku beriya ew xewna xwe bikin rastî DAIŞ´ê ew qetil kirin, Cihan û Ednan Hesen bi vî karî rabûne û navê Rodî û Perwînê li pirtûkxaneyê kirne.
Di dema komkujiya DAIŞ´ê de çete ketin mala Ednan Hesen jî. Ew li malê nebû hingê, wan 11 kesan ji malbata wî qetil kirin. Di nav van kesan de xwişka wî Perwîn û zavayê wî Ednan jî hebûn.
Ednan biryar da ku li vê malê bimîne û wê veguherîne bîrdariyeke ji bo komkujiya 25´ê hezîranê.
Roja îro li odeyeke malê wêneyên endamên malbatê hatine daliqandin, li odeyekê jî pirtûkxane ava kir ku bi rêk û pêk berfireh dike. Vê serpêhatiya Ednan tesîr kir li Frankfurter Buchhandlungskollektivê û wê nameyek ji wî re şand û jê re hevkariya xwe anî ziman.

## Estetîk

**Xelîl XEMGÎN**

Pênaseya estetîkê xemil û şeml, wêne û nîgara seranser xîtabetî çav, guh û dil dike ye. Dizanim, mijarek gelekî fireh e. Fîlozof û pisporan der barê estetîkê de gelek pirtûk û lêkolîn nivîsandine.
Bêguman nirxandina dîroka estetîkê û berhemên der barê estetîkê de hatine afirandin.
Estetîk bi serê xwe lêkolîn û lêgerîn e, kar û barê pispor û zanyaran e. Lê belê tiştê hêsan û bi me pêwîst ew e ku em di jiyana xwe û xebata xwe de, prensîba estetîkê piştguh nekin. Her wiha bizanibin ku pîvana estetîkî, ked û xebata mirovan, civakan û dozên mafdar mayînde û resen dike.
Bi kurtasî estetîk, ji destpêka civaka mirovahiya yekem de, di her babetên jiyanê de, heya roja me ya îro, bi qasî sazkirina jiyana mirovahiyê kevnar e û bi qasî pêşketina mirovahiyê çalak e. Di seranserê jiyana mirovahiyê de, di her babetê de, mayînde û bi nirx e. Mînaka her li ber çav ew e ku kevneşopiyên dîrokî, keleh û şûnwarên mirovan ava kirine. Neqş û wateyên di huner de, şopên kevnar in. Îroj bûne nirxên mirovahiyê. Mirov bi hesanî dikare bêje ku di dîroka civakan de, mamoste û afirenêrê estetîkê jin bi xwe ye.
Bi destûra we be, ka em vê mijarê belav nekin. Dixwazim bêhtir di xebatên çand û hunerê de, pîvanên estetîkî û hişmendiya tengezar, bê çawa armancên mezin û nirxên bedew, ji ber tengezariya hişmendî, di oxira hesabên biçûk de, armancên mezin xav û xam dike de, hinekî li gorî têgihîştina xwe bi were par ve bikim.
Bi bîranînekê dixwazim derbasî mijarê bibim. Li bîra min e, 28 adara 1986'an de fermandar Egîd jiyana xwe ji dest dabû, bi hejmarek taybet rojnameya Serxwebûnê der barê kesayeta leheng û mêjuyê qehremaniyê de, nirxandinên fireh û kûr weşandibûn. Der barê wê pêvajoyê de Rêber Ocalan nameyek taybet, ji saziya me Hunerko re rêkiribû.
Di wê nameyê de, ango mijara lehengî û kesayeta afirener de ji bo civak çawa mayînde dibe nirxê civakan, bi dorfirehî dinirxîne. Girêdayî vê mijarê, der barê kar û xebatê hunerê de, hem rexne hem jî perspektîfên giranbiha diyar kirine.
Di nirxandina çalakiyên me ên hunerî de wisa dibêje: "...ezmûn û derfetên we kêm in, bi şert û mercên hun tê de ne jî, dizanim... Ji xwe cewhera hunerê ew e ku di hoyên tengezar de, bikaribe ronahiyê peyda bike. Lê ez çalakî û berhemên we dişopînim, di bin navê fedekarî, şoreşgerî û partîzanî de... We cewhera hunerî baş fêm nekiriye û hun qedrê xebata xwe baş nanirxînin. Huner bi estetîkê dibe huner û mayînde dibe. Ez meyla xwe didim we, ji cil û bergên we, heta disiplîn, liv û tevgêra we, ji heybeta huner û hunermendiyê de gelekî dûr e. Di sekin û liva we de, estetîk tune ye. Ji ber vê yekê jî hûn di amatoriya xwe de israr dikin.
Dikarim bêjim ew dersa estetîkê ya yekemîn bû ji bo me. Me çendî girîngî da mijara estetîkê, an me piştguh kir. Êdî ew jî mijarek din e.
Bi taybetî di van salên ku teknolojî û amûrên modernîteyê bi pêş ketine de, qelandin û sohtandina nirxan, mîna ku vejandina çand û hunerê be, çavên mirovan bi xapînokên estetîka sexte boyax dikin. Jiyana erzan, şuhreta lezgînî, hêrsa dirav û madiyetê, ji xwe pêdiviyên estetîkî bi derfetên teknîkî, rêya xapandina çav û guh ya herî hêsan e. Tenê bila diravên te hebin, bila xema te ya şuhret, navtêdan û populîzmê ne be…
***Çavkanî e-rojname***

# Şaredariya Reqayê pirsgirêkan çareser dike

**Şaredariya Gel ya Reqayê hewl dide bi derfetên heyî pirsgirêkên welatiyan yên jiyanî çareser bike. Hevserokê Rêveberiya Şaredariya Gel a Reqayê diyar kir ku di demeke nêzîk de wê pirsgirêka kombûna avê li ser rêyan li taxên bajêr çareser bikin.**



Hevserokê Rêveberiya Şaredariya Gel a Reqayê diyar kir ku di demeke nêzîk de wê pirsgirêka kombûna avê li ser rêyan li taxên bajêr çareser bikin.

Ji ber sedemên şer û kombûna avê li kolanên taxên Reqayê, şênî astengiyan dibînin û tevgera çûn, hatin û trafîkê di hundirê bajêr de astengiyan çêdikin.

Şaredariya Gel hewl dide bi hemû derfetên xwe vê pirsgirêka rêyan û şebekeya kanalîzasyonê çareser bike, lê rewşa hewa û barîna baranê nahêle ev kar were kirin.

Welatiyê bi navê Ebd El-Celîl der barê pirsgirêkê de wiha got: "Di zivistanê de av di van rêyan de kom dibe, siware zirarê dibînin û em daxwaz dikin şaredarî rêyan sererast bike."

Her wiha ajokar Mihemed El-Ewed jî wiha got: "Ava li kolanan kom dibe siwareyan û bi taybet ên biçûk ziyandar dike û em her roj diçin herêma pîşekariyê, ji bo restorekirina siwareyan."

Ji ber vê yekê şênî ji şaredariyê daxwaz dikin ku kortên av tê de kom dibe, li kolanan sererast bikin, ji ber ku çûn û hatinê asteng dikin.

Hevserokê Rêveberiya Şaredariya Gel Ehmed Ibrahîm wiha got: "Nêzî 140 km ji rêyên Reqayê sererastkirinê dixwazin û hemû kes dizane kargehên qîrkirinê sekinîne ji ber baranê û wê di meha Nîsanê de tevahî rê werin qîrkirin û niha bi demkî kort bi bermahiyan werin sererastkirin. Ji bo giliyên şêniyan li ser kombûna avê li kolanan, ji ber pirraniya taxên Reqayê kanalîzasyonên wan tune ne, hemû kort in û di plansaziya 2019'an de ev pirsgirêka kanalîzasyonê dê çareser bibe…*ANHA*

## Malpera şehîdên şoreşa Rojava hat vekirin

YPG'ê ji bo danasîna şehîdên Bakurê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê li ser internetê malperek vekir.


Navenda Çapemenî û ragihandina YPG'ê bi daxuyaniyekê ragihand ku ji bo danansîna şehîdên Bakurê Sûriyê û Rojavayê Kurdisanê li ser internetê malperek vekir.

Daxuyanî wiha ye;

"Bi armanca danasîna cangoriyên şoreşa Rojava û şehîdên di oxira rizgarkirina xaka Bakurê Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê bûn fedayî, em malpera şehîdên Rojava pêşkêşî gelê xwe dikin.

Di herêma me de şer û aloziya ku 7 salan li pey xwe hişt îro gihîşt qonaxa afirandina jiyanek û pergalek nû ji bo gelê Rojava. Ji rizgarkirina bajarê Kobanê di sala 2012an û vir de, di herêma me de li hember her cûre paşverûtî, mêtingerî û talangeriyê şerekî bê navber û bê hempa hat dayîn. Di encama vê têkoşîna mezin de, xala ku îro em gihîştinê him ji bo Kurdistan û Sûriyê, him jî ji bo hemû derdorên ku di lêgerîna jiyanek azad de ye bû çirûska hêviyê. Bêguman azadiya ku îro gelê me di vî parçeyê Kurdistanê de dijî, encama xebata pakrewanên me ye. Encama ked, xebat, azwerî û xwîna wan e.

Em jî weke xebatkarên çapemeniya YPG, YPJ û QSD vegotina çîroka van şehîdan ji xwe re weke erka herî sereke û xebatek pîroztirîn dibînin. Li ser vê esasê, bi armanca danasîna lehengên ku di oxira parastina nirxên şoreşê de şehîd ketin, em malpera www.sehidrojava.info pêşkêş dikin. Weke navgîneke dewlemend ya ku herkes dikare tê de şehîdên şoreşa Rojava nas bike û weke arşîvek ku hemû şehîdên Yekîneyên Parastina Gel, Yekîneyên Parastina Jin û Hêzên Sûriya Demokratîk li yek platformê tîne gel hev e.



Hemû şopînerên me dikarin bi rexne, pêşniyar û nirxandinên xwe tevkarî raber bikin; bi nivîs, gotar an jî dîmenên hevalên şehîd yên ku nas dikin dikarin di mezinkirina vê platformê de bibin xwedî rol."

## Stadyoma Reqayê Pêşwaziya dewriya dawî ya Firatê dike

Bi Armanca ku ser çawaniya li darxistina lîgeya dewreya dawî û guhdarkirina nirxandnên beşdarvanan Hevserokê Desteya Ciwan û Werzîşê ya girêdayî Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê li avahiya Meclisa Sûriya Dîmokrtaîk a li Eyîn Issa civînek ji Rêvebirên dewriya Futbolê ya Firtê re li darxistin.

### BÎ ARMANCA JÎNÛVE STSAYOM BÊ ÇALAK Û ZÎNDÎKÎRÎN

Di çarçoveya civînê de satdyoma ku dewriya dawî li bê li darxistin dengdan hate kirin û di dengdanê de stadyoma Reqayê ya bi nave "Stadyoma reş" derket. Ev stadyoma Beledî ya li Reqayê di 2006'an de nû hatibû avakirin, her wiha stadyom têra 15 hezar camewer dike. Lê di di sala 2014'an de dema ku çeteyên DAIŞ'ê bajarê Reqayê dagirkirin ew stadyoma ya bû cihê girtîgeha DAIŞ'ê ku hemû cureyên îşkenceyan li dîlgirtiyên sivîl yên Reqayê dikirin. Ji bo wê jî navê stadyomê bû "stadyoma reş anjî noqteya 11" jiber ku ew stadyom nêzî 11 noqtryên çeteyên DAIŞ'ê bû ji bo wê jî ev nav lêdikirin, kesê ku ji wê girtîgeha reş bi saxî derketiba wekî ku jinûve ji dayîk bûye dihate dîtin. Da ku ev nav û reşî bê guhertin û jinîve jiyan û tureyên futbolê û hemû cûreyên werzîşê zindî bikin ev stadyom hate hilbjiartin. Tîmên ku di qureya dewreya çaremîn hatin diyer kirin evin: Seda Tebqayê X Ciwanên Girê Sipî



Yekîtiya Minbic X Hêza Ewlehiya Reqa

Emel Rîhab Minbic x Ciwanên Reqayê

Firat Kobanê X Wefaa Reqa

Hêhayî bi bîrxistinê ku dewrî di dîroka 12'ê Cotmehê de bi beşdarbûna 16 tîman ser 4 gruban hatin debeşkirin, her wiha her grubek di dewriyekê de serketin e yanî ya yekemîn û duyemîn gihiştin dewriya çara ya dawî.

***Ciwan Mihemd***

## Projeyên biçûk yên çandina şitilan



Welatiyên Dêrazorê bi pêşxistina projeyên meştelên çandiniyê debara jiyana xwe pê dikin.


Meştelên biçûk di hundirê gulistanên taybet de çêdibin û şitilan diparêzin û hejmara wan zêde dikin û difiroşin.

Hemwelatî Ecîl El-Ebûd ji gundê El-Seûd yê rojavayê Dêrazorê ye û karê meştelan dike, wiha axivî: "Min projeya xwe bi pereyên hindik dest pê kir û li gorî derfetên xwe şitilan bi rêya siwareyên taybet ji Efrînê û Hemayê tînim."

Ebûd di berdewama axaftina xwe de wiha got: "Min destpêkê 700 şitilên cur bi cur anîn, wekî hemdiyat, sêv, canirk, mircan, kîna, loz, zeytûn û hinar û debara xwe pê dikim. Buhayê her cureyekî cihê ye û ji hezar heta 3 hezar lîreyên Sûriyê ye."

Dema çandina şitilan di Çile heya dawiya Sibatê de ne… *ANHA*

## RAMANÊ RÊBERTIYÊ



### Bi kurtî pêkhatina dîrokî ya rastiya kurd

**Abdulah Ocalan**

Ez di beşên (cild) berê yên parêznameyên xwe de li nava dîrokê bi pey rastiya Kurd ketibûm. Lewma ji dubarekirinê zêdetir, li qonaxên girîng der barê diyardebûna wê de mirov hinek analîzan bike, bawer dikim wê bêhtir kêrhatî be, û mirov ê pê pêşiya xwe bibîne. Kurdîtî di dîrokê de rastiyeke timî di cihê xwe de sabit û bistbûyî sekinî nîne. Weke her diyardeyeke civakî bi veguherînê hebûna xwe pêşde dibe. Veguherîna di rewşa aniha de berfirehtir û bileztir e. Diyardeya Kurd a roja me ya îro di pêvajoyeke werê re derbas dibe pêdiviya xwe bi ravekirineke berfireh heye. Di rêûresma berê de bi awayekî hunerî xweîfadekirin yek ji şêwazan e ku herî zêde mirovan pêk aniye. Ji vî alî ve Kurdîtiyê bi rêya muzîkê hewl daye xwe bide naskirin. Bi vî awayî, ji bo heqîqeta Kurd muzîk dibe şêwazê herî girîng ê îfadeyê. Di şêwazê zanistî yê piştrastkirî de pêşketinên girîng hene. Hewldan hene ku bi têgînên dîrokî û civakî Kurdîtî bi rêbazên cuda bê ravekirin û piştrastkirin. Xebata akademîsyenan bêhtir di vî warî de ye. Nêzîkatiyên li ser bingehên îdeolojîk bêhtir bi îdealên rizgarîxwaziyê barkirî ne, lê tevî vê, ji bo îfadekirina heqîqetê jî pirr kêrhatî ne.

Bêguman karekterê çînî yê her îdeolojiyê li gorî xwe bi heqîqetekê radibe. Herçiqasî her model bi tena serê xwe hewl bide heqîqetê rave bike jî bi tenê dikare beşekî ji temsîla rastiyê îfade bike. Diyardeya civakî bi xwe zorê dide vê yekê. Mîna tabloyeke sêrengî ye, çawa ku di nava wan de rengekî beloq têrê neke wan îfade bike. Di ravekirina civaka dîrokî de nêzîkatiyên tek modelî di warê temsîla rastiyê de timî kêm in, û mirov ê bi wan bixape. Kengî mirov asta şêwe û maneya tevlîhev a civakan li vê zêde bike, hingê bikaranîna yekpare ya tevahiya rêbazên temsîla parçeyên rastiyê dikin girîng dibe.

Di serdema me de rêbazên zanistî giraniya xwe çêdibin, lewma pêşhukmên dibêjin, rêbazên din nikarin heqîqetê îfade bikin, bi hêz dibin. Lê kaosa zanistî ya pêk tê, eşkere kiriye ku rêbazên xwe sipartiyê bi temamî têrê nakin. Rêbaza zanistî bi xwe kelemekî ciddî ye ku nahêle mirov li heqîqetê serwext bibin û fêhm bikin. Her ku diçe têkiliya rêbaza zanistî bi îdeolojî û desthilatdariya hegemonîk a sîstema şaristaniya Rojava re eşkere dibe. Ji bo hebûn xwe pêk bîne, pêdiviya xwezaya wê ye ku nêzîkatiyên beş û gerdûnî yên der barê heqîqetê de bi hev re bi kar bîne.



# Armanca Tirkiyê dagirkirina Sûriyê ye



**Jinên endamên partiyên siyasî yên li bajarê Helebê bertek nîşanî gef û êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê Sûriyê dan û diyar kirin ku serokê rêjîma Tirk Erdogan hewl dide li herêmê şerekî nû derxîne. Jinên siyasetmedar dan zanîn ku Tirkiye dixwaze beşek din axa Sûriyê dagir bike.**

Siyasetmedarên jin ên taxa Şêxmeqsûd a Helebê anîn ziman ku daxuyaniyên Erdogan nîşaneya şerekî nû li herêmê ne û diyar kirin ku armanca Erdogan a vî şerî dagirkirina beşek ji xaka Sûriyê ye.

Jinên siyasetmedar yên di partiyên siyasî li bajarê Helebê de derbarê gefên serokê rêjîma Tirk Receb Erdogan yên li dijî Bakurê Sûriyê de axivîn û diyar kirin ku Tirkiyê hewl dide di bêdengiya civaka navneteweyî de şerekî nû pêk bîne.

### ARMANÇ DAGIRKIRINA SÛRIYÊ YE

Endama Buroya Jinan a Meclisa Partiya Pêşerojê ya Sûriyê û Endama Meclisa Jinên Sûriyê Necla Hemza wiha got: "Piştî rizgarkirina xaka Sûriyê ji DAIŞ`ê û nêzîkbûna tunekirina wê, serokkomarê Tirkiyê Erdogan dest bi gefên êrîşkirina li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kir. Armanca xwe li herêmê despêkirina şerekî nû ye û dagirkirina beşek ji xaka Sûriyê ye."

Neclaa diyar kir ku Erdogan bi vê siyaseta xwe Sûriyê xirab dike û temenê aloziya Sûriyê dirêj dike, li aliyekî din jî rola jinan biçûk dixe.

Neclaa Hemza ji rêxistinên navnetewî û Neteweyên Yekbûyî xwest ku van gefan bidin sekinandin û wiha dewam kir: "Divê sînorek ji siyaseta Erdogan re bê danîn û nehêlin xaka me dagir bikin û jin û zarokan bidin kuştin."

### TIRKIYE JINAN DIKE HEDEF

Seroka Buroya Perwerdeyê ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê Behiye Ibrahîm diyar kir ku gef û êrîşên dagirkeriya Tirkiyê li ser xaka Sûriyê nasekinin, ji destpêka dagirkirina Bab, Cereblûs û Efrînê ve, niha jî gefan li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwin.

Behiyê diyar kir ku dagirkeriya Tirkiyê di serî de jinan dike hedef, piştî ku di aliyê siyasî û civakî de xwe bi pêş xistin, tiştê ku li Efrînê rû dide mînaka kuştin û revandina jinan e.

### DIVÊ SÎNOREK JI ÊRÎŞAN RE BÊ DANÎN

Endama Meclisa Giştî ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê li Helebê Xalîde Ebdo jî diyar kir ku tiştê ku rû dide hewldanên fitne û vegera terorê ye.

Endama Meclisa Giştî ya Partiya Pêşerojê ya Sûriyê bêdengiya navneteweyî şermezar kir û wiha got: "Bêdengiya navneteweyî tê wateya hevkariya bi dewleta Tirk re."

Xalîde di dawiya axaftina xwe de bang li gelê Sûriyê kir ku bi yekdestî li pêşiya van gefan bisekinin…*ANHA*



## 7 hezar jin tevlî xebatê bûn

Endama Rêveberiya Aboriya Jinê ya Herêma Cizîrê Şêrîn Emîn û Endama Buroya Têkiliyên Diplomasî ya Kongreya Star Feryal Hesen xebatên di derbarê aboriya jinê yên salane nirxandin û gotin: "7 hezar jin di sala 2018'an de tevlî xebatê bûn."

Endama Rêveberiya Aboriya Jinê ya Herêma Cizîrê Şêrîn Emîn û Endama Buroya Têkiliyên Diplomasî ya Kongreya Star Feryal Hesen xebatên di derbarê aboriya jinê yên salane nirxandin û gotin ku ji bo hemû hemû jinan qadên xebatan hatin avakirin.

KOOPERATÎF HATIN PÊŞXISTIN

Derbarê xebatên salekê yên Aboriya Jinê yên herêma Cizîrê de, Endama Rêveberiya Aboriya Jinê ya Herêma Cizîrê Şêrîn Emîn axivî û anî ziman ku Aboriya Jinê li ser asta herêma Cizîrê hatin rêxistinkirin û got: "Di çarçoveya rêxstinkirina Kantona Qamişlo û Hesekê de, endamên navçe û bajarokan Yekîtiya Kooperatîfan ava kirin û xebatên xwe dan meşandin. Navendên Aboriya Jinê li tevahî bajarên Bakurê Sûriyê hatin birêxstinkirin."

Şêrîn da zanîn ku xebat bi rengekî nû hat meşandin û wiha dewam kir: "Li kantona Hesekê kooperatîfên nû hatin vekirin. Li kooperatîfa firin, ya konserve, kargeha mirîşka bi reng û destên jinê xebat pêş ket. Her wiha li Kantona Qamişloyê jî sûka jinê, çandinî, firin, xwaringeh û gelek xebatên din hatin meşandin."

7 HEZAR JIN DIXEBITIN

Şêrînê bal kişand li ser hejmara jinên ku kar û xebatê dikin û aboriya xwe pêş dixin û wiha got: "Di vê salê de 7 hezar jin dixebitin. Her wiha di aliyê çandiniyê de jî 61 hezar donim di destên jinê de ye, ew jî bi rengê kooperatîf xebatê didin meşandin. Di aliyê bazirganiyê de gavek xurt dan destpêkirin. Bi vekirina Sûka Jinê li Dêrikê xebat pêş ket û her wiha niha amadekariya Sûka Jinê li navçeya Amûdê tê kirin. Di sala 2018'an de gelek endam û qad hatin bi rêxstinkirin, jinên ji pêkhateyên cuda tevlî xebatên Aboriya Jinê bûn. Ji aliyê jinên Ereb de tevlîbûnek xurt çê bû. Di sala nû de ji bo herêmên ku nû hatine rizgarkirin em ê xebatên Aboriya Jinê li wir mezintir bikin. her wiha sererastkirin û nûvekirina kooperatîfan li gorî rêziknameya Aboriya Jinê, ew ê bidome."

PÊŞKETIN ZÊDE DIBE

Endama Rêveberiya Buroya Têkiliyên Diplomasiyê ya Kogreya Star Feryal Hesen jî di derbarê xebatên xwe yên li herêma Cizîrê de wiha got: "Me kar û xebatên cuda kirin. Kongre û konferansên li hundur û derve hatin çêkirin. Me li ser esasên Netewa Demokratîk xwe bi rêxistin kir. Me têkiliyên xurt di nava jinên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen û Tirk de ava kirin. Dema ku têkiliyên jinan xurt dibe pêşketin zêdetir dibe. Me hemleya "Jin ji bo Efrînê rabin ser piyan" dest pê kir. Ji ber ku jinên Rojava li her qadê xwe pêş dixin loma çavên cîhanê li ser wan e. Me meşa jinên cîhanî jî li dar xistin û vê meşê deng veda. Em beşdarî xebatên li ser çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê bûn."

Feryal Hesen herî dawî wiha got: "Li seranserê Rojavayê Kurdistanê û bi taybet li herêmên ku nû hatin rizgarkirin Tebqa, Reqa, Dêrezor, Minbicê li ser azadiya jinê, Netewa Demokratîk, roja 25'ê mijdarê semîner hatin dayîn. Her wiha bi hemleya "Jin ji bo Efrînê rabin ser piyan" têkiliyeke gelek xurt di navbera jinan de hat avakirin. Kar û xebatên me yên ji bo Rêber Apo û rizgarkirina Efrînê dewam dike…*JINNEWS*

## Endamên Jin yên FARC'ê xwestin tecrîd bi dawî bibe

Endamên FARC'ê yên Jin diyar kirin ku tecrîda li Îmraliyê li dijî mirovahiyê ye. FARC'ê xwest, tecrîd bi dawî bibe û Leyla Guven jî silav kir.FARC'ê, piştî têkoşîna 50 salî ya li Kolombiyayê, derbasî nava qada sivîl û siyasetê bû û navê "Hêza Şoreşger a Alternatîf a Gel" li xwe kir. Endamên FARC'ê yên Jin, bi daxuyaniyekê destek dan Leyla Guven.

### ASTENGIYA LI PÊŞIYA ÇARESERIYÊ

Di daxuyaniyê de ji bo berdana Guven bang hate kirin û hate xwestin ku danûstandinên aştiyê yên ji aliyê hikumetê ve hatin rawestandin ji nû ve dest pê bikin. FARC'ê tecrîdkirina Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan weke kiryareke li dijî mirovahiyê û li dijî qanûnan bi nav kir û xwest, tecrîd bi dawî bibe.




Di daxuyaniyê de hate gotin, "Girtina Ocalan li pêşiya çareseriya siyasî û aştiyane ya rewşa gelê Kurd asteng e û li dijî hemû peymanên navneteweyî ye."

Di dawiya daxuyaniya FARC'ê de hate bibîrxistin ku li gel wekîlên HDP'î zêdeyî 5 hezar kesên destekê didin partiyê hatine girtin û hate gotin, "Em piştgiriya greva birçîbûnê dikin û ji bo karibe bi karê xwe yê qanûndanînê rabe hêvîdar in ku wê di demeke kin de Leyla Guven bê berdan."

## Jineolojî dîrok û xwezaya jinê şîrove dike

Endamên Kongreya Star ên ku tevlî perwerdeya Jineolojiyê bûn gotin: "Di nava civaka xwezayî de jin xwedî kedek mezin û afirîner e."

Ji bo danasîna Zanista Jineolojiyê li Şehbayê perwerde ji bo endamên Kongreya Star, Dada Civakî, Yekîtiya Êzidiyan, Jinên Ciwan, Desteya Aborî, Meclîsa Sûriya Demokratîk da. Jinên ku beşdarî perwerdeyê bûn gotin:"Jineolojî ji bo pêşketina jinê û civakê gelekî girîng e."

### PÊDIVIYA BI ZANISTA JINEOLOJIYÊ

Seroka Desteya Jinê Zelox Reşîd got: "Dema ku jin beşdarî perwerdeyê dibin û lêkolînê dikin digihêjin asteke bilind. Jixwe Rêber Apo jî ji bo jin pêş bikevin û azad bibin ev felsefe pêşniyar kiriye. Ji ber feraseta mêr a serdest her dem jin ji mafê xwe bêpar hatiye hiştin. Jin ji bo ji mafê xwe bêpar nemînin û têkoşîna xwe mezintir bikin pêdivî ji zanista Jineolojiyê heye."

### DIVÊ JIN LI SER JINEOLOJIYÊ PERWERDE BIBIN

Endama Komîteya Jinê ya Meclîsa Herêma Efrînê Sûreya Mustefa wiha got: "Ji dîrokê heta niha em ji bo destkeftiyên xwe têdikoşin. Serkeftina jinê bi zanista Jinolojiyê girêdayî ye. Di berxwedana Efrînê de jî jinê ev serkeftina xwe nîşan da. Dema em perwerdeya Jineolojiyê dibînin em cudatiyek mezin di xwe de dibînin. Ev jî ji bo pêşketinê gelek baş e. Divê hemû jin beşdarî perwerdeya Jineolojiyê bibin."

### JINEOLOJÎ DÎROKA JIN VEDIBÊJE

Ji aliyê din de Hevseroka Meclîsa Herêma Efrînê Şêrîn Hesen jî wiha got: "Di nava civaka xwezayî de jin xwedî kedek mezin û afirîner e. Lê mêr li ser keda jinê rûniştin. Zanista Jînolojiyê bingeha xwe ji hezkirina jinê digire. Ji bo ku zihniyeta serdest a mêr civakê ji xwe re bike kole, keda jinê dizî û binpê kir. Niha em bi



zanista Jineolojiyê têkoşîna li dijî feraseta serdest a mêr dikin. Mêr dixwaze bi çîrokên xeyalî jin ji zanistê dûr bikeve. Ji bo jin dîroka xwe nas bike divê jin xwe bi rêxistin bike. Ev yek jî bi saya zanista Jineolojiyê pêkan e. Jineolojî ji bo pêşketina jinê û civakê gelekî girîng e."…*JINNEWS*

# Em beriya Emerîka jî li vir bûn û me têkoşîn dikir

**Hevserokê TEV-DEM'ê Xerib Hiso, der barê biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyê de axivî û diyar kir ku armanca daxuyaniya DYA hedefên siyasî ne û wiha got, "berî Emerîkayê jî li ser vê axê têkoşîn û berxwedana me hebû. Em bawer nakin DYE bi hêsanî dest ji destketiyên xwe yên li berde û here."**


Hevserokê TEV-DEM'ê Xerib Hiso, der barê biryara vekişîna DYA'yê ya ji Sûriyeyê nirxandin kir û got: "Em bêyî vê hêzê jî hebûn. Ji destpêka hebûna xwe em di nava berxwedanê de ne. Çanda me ya têkoşînê heye. Stratejî û hişmendiya me li ser berxwedanê hatiye avakirin'

Piştî Serokê AKP'ê û Serokkomar Recep Tayyip Erdogan gef li Bakur û Rojhilatê Sûriye xwar, Rayedarên DYA duh daxuyanî dan û destnîşan kirin ku hêza xwe ji Sûriye vedikişînin. Têkildarî biryara DYA'yê Hevserokê Tevgera Civaka Demokratik (TEV-DEM) Xerib Hiso, axivî û anî ziman ku ew bawer nakin ku DYA van destkeftiyên xwe bi hêsanî berde û wiha got: "Biryara DYA ku ji Sûriye derkve ne biryarek nû ye. Ev mijar berê jî hatibû niqaşkirin. Ev biryar berê hatiye niqaşkirin û amadekariya wê berê hatiye kirin. DAÎŞ bi awayekî fîzîkî bi dawî bûye, lê bandora wê hêj berdewam dikin."

Hiso, da zanîn ku daxuyaniya Qesra Sipî zêde mezin dikin û wiha berdewam kir: "Niha weki ku em bi vê hêzê hene daxuyanî tên dayîn. Em berî vê hêzê jî hebûn. Têkoşîna me ji destpêkê de didome. Kurd berê kurd in û berê li nasname û hebûna xwe xwedî derdikevin. Bi salan e em di nava têkoşîna şoreşê de ne. Hişmendî û stratejiya me li ser çanda têkoşîn û berxwedanê hatiye avakirin. Her kes vê yekê divê baş zanibin. "

Hiso, anî ziman ku armanca daxuyaniya DYA hedefên siyasî ne û wiha bi dawî kir: "Piştî van daxuyaniyan di rojekê de vê axê bernadin û naçin. Li vir hêj polîtîkayên wê yên têxin meriyetê hene. Meseleya herî girîng Îran e. Ev biryar dikare herêmê vegerîne qada şerekî mezin û kaosê jî. DYA mezin û dûr difikire. Hesaban dike û gavan davêje. Mesele di çapemeniya navneteweyî de pir cuda tê niqaşkirin. Wekî ku dawiya cîhanê hatibe niqaş tên kirin. Li vir vîn û têkoşîna gelan heye. Berê berxwedan hebû dê dîsa berxwedan hebe. Vekişîna vê hêzê ji bo me zêde tiştekî nade guhertin. Me tu carî vîna xwe teslîm nekiriye û em tu carî vîna xwe teslîm nakin. Em li vir xwedî hêzek mezin û xurt in. Gelê herêmê li vir ne bê alternatif in. Şoreş didome…*MA*

## Gelên Minbicê wê herêmên xwe biparêzin


Hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbêcê Mihemed Xêr Şêxo diyar kir gefên Tirkiyê wan natirsînin, wê li hember gefên Tirkiyê bisekinin û herêmên xwe biparêzin.

Hevserokê Meclisa Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Mihemed Xêr Şêxo têkildarî êrîşên dewleta Tirk yên li ser Bakurê û Rojhilatê Sûriyê axivî û anî ziman ku gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê wê bi hevre li hember gefên derve ku ewlehiya herêmê dikin hedef, bisekinin.

Mihemed Xêr destnîşan kir ku Minbic beşek ji Bakurê Sûriyê ye, di demên dawîn de gefên Tirkiyê li ser herêmên Rojhilatê Firatê, di nav de Minbic, hene.

Şêxo anî ziman ku Rêveberiya Minbicê bi hemû pêkhateyên xwe yên Ereb, Tirkmen, Çerkes, Kurd û Ermen bi hev re dijîn û Minbicê di hemû aliyan de bi rê ve dibin.

Şêxo bibinketina DAIŞ'ê li Dêrazorê û gefên Tirkiyê bi hev ve girê dan û wiha got: "Hevkariya Tirkiye û DAIŞ'ê diyar e, dema şerê rizgarkirina Hecînê hate ragihandin ku xaka dawî ya di destê DAIŞ'ê de maye, dagirkeriya Tirkiyê êrîşî herêmên aram û gelê sivîl ên li Bakurê Sûriyê kirin. Niha DAIŞ ber bi tunebûnê ve diçe , ji ber vê yekê hikumeta AKP'ê plan êrîşa li herêmên Bakurê Sûriyê yên rizgarkirî bike."Di dawiyê de hevserokê Meclisa Rêveber a Rêveberiya Sivîl a Demokratîk a Minbicê Mihemed Xêr Şêxo bang li şêniyên Minbicê kir ku bi hevre li hemberî gefên têkbirina ewlehiya herêmê bisekinin û wiha got: "Divê em li rex Meclîsa Leşkerî ya Minbicê û Hêzên Ewlekariya Hundirîn bisekinin û herêmên xwe biparêzin."…*ANHA*

## Em ê nehêlin ku xewna Erdogan pêk were


Rûspiyên êlên navçeya Til Hemîsê diyar kirin ku ew ê xaka xwe li dijî êrîşan biparêzin û gotin; "Erdogan dixwaze xewna Osmaniyan yên ku Şêx Şemer kuştiye vegerîne, lê em rê nadin ku carek din dubare bibe."

Nerazîbûnên girêdayî gefên serokê rêjîma Tirkiyê Recep Erdogan li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê zêde dibin.

Rûspiyên êlên Ereb ên nvaçeya Til Hemîsê diyar kirin ku armanca Erdogan ji van gefan têkbirina ewlehî û aramiya herêmê ye.Rûspiyan diyar kir ku eger Tirkiye di nav bêdengiya navnetewî de êrîşî herêmê bike ew ê li hember êrîşan bisekinin.

Rûspiyê êla Şemer a Ereb a navçeya Til Hemîsê Mifdî El-Tifah axivî û wiha got: "Mafê tu dewletekî nîn e ku bi rêbazên ne rewa dewleteke din dagir bike yan jî êrîşî wê bike."

EL-Tilfah gefên Erdogan şermezar kir û wiha got: "Ne ji mafê Erdogan e mudaxeleyî herêmên me yên bi ewle bike."

El-Tifah di berdewama gotinên xwe de da zanîn ku armanca Erdogan ne tenê gelê Kurd e lê belê hemû gelên herêmê ye û wiha dewam kir: "Ev herêm hatibû paşguhkirin. Gelek komên terorîst ew dagir kirin û tevliheviyek li herêmê derxistin, heta gihaşt asta ku mirov nedikarî bi saxlemî bigihîje mala xwe."

El-Tifah destnîşan kir ku bi hevgirtin û yekitiya pêkhateyên herêmê ji Kurd, Ereb û Suryan, herêm rizgar kirin û pergaleke demokratîk ku mafê hemûyan mîsoger dike, ava kirin û got, "Em naxwazin tu kes mudaxeleya me bike û em wek gelê Sûriyê dikarin pirsgirêkên xwe bi xwe çareser bikin."

Di dirêjahiya gotinên xwe de Mifdî El-Tifah diyar kir ku armancên Erdogan mîna planên kal û bavên xwe yên Osmanî ne, û got, "Împaratoriya Osmanî şêxê êla Şemer Ebdulkerîm Sefûk El-Cerba El-Farês ji ber kar û barên girêdayî neteweya Erebî darve kiriye û beriya wê jî bavê wî Şêx Sefok darve kiriye. Eger lawaziyek di neteweya Ereb de tune bûya, wê demê Erdogan gef li herêmê nedixwarin."

El-Tifah destnîşan kir ku aramiya herêmê ji bo şêniyên herêmên din ên Sûriyê hêviyek e, ji lewre berê xwe didin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê.

Rûspiyê êla El-Tifêhyîn Silêman Mihemed Silêman diyar kir ku gelên Bakurê Sûriyê li ser bingeha biratiya gelan dijîn û destnîşan kir ku hemû şêniyên herêmê jin, zarok û mêr fedayîyên xaka xwe ne. Silêman wiha dewam kir: "Em hemû gelê Sûriyê ne û em ê parastina xaka xwe bikin. Em gefên Tirkiyê û her gefek tevahiya Sûriyê dike hedef qebûl nakin."

Girêdayî êrîşên dewleta Tirk yên li ser herêmê, Silêman ev tişt anî ziman: "Erdogan dixwaze xewnên Osmaniyan û bi taybet bi dagirkirina herêmên bakurê Sûriyê vegerîne."

Têkildarî heman mijarê rûspiyê êla El-Reîdat a navçeya Til Hemîsê Beşîr El-Şemalî jî destnîşan kir ku ew wek êlên destwredanên Tirkiyê qebûl nakin . Beşîr El-Şemalî tekez kir ku ew wek êlên herêmê amade ne li hember her êrîşekê li dijî Bakur û Rojhilatê Sûriyê bisekinin…
*ANHA*

## Bila Tirkiye jî ji Sûriyê vekişe



Temellî li ser biryara DYE'yê ya vekişîna ji Sûriyê got, "Bila hemû hêzên derve ji Sûriyê vekişin. Bila DYE vekişe, Tirkiye û Rûsya jî vekişe."

Hevserokê Giştî yê HDP'ê Sezaî Temellî serdana rêxistina partiya xwe ya Amedê kir. Temellî piştî serdanê bersiv da pirsên rojnamevanan.

**'PÊVAJOYA KRÎTÎK DEST PÊ KIR'**

Temellî bi bîr xist ku greva birçîbûnê ya Leyla Guven di roja 43'an de ye û got, "Ev greva birçîbûnê rabûna li ber tecrîda li Îmraliyê ye, daxwaza ji bo dawîanîna tecrîdkirina Birêz Ocalan e. Ev greva birçîbûnê girîng e. Ji bo aştî û demokrasiya Tirkiyê ye."

Temellî careke din bang li raya giştî ya Tirkiyê kir û got, "Em di roja 43'an de ne û weke ku doktorên Birêz Leyla Guven eşkere kirin, pirsgirêkên xwe yên tenduristiyê hene, li xwe kêm kiriye û dema krîtîk dest pê kiriye. Bêyî ku dereng bikevin divê her kes bi erk û berpirsyariya xwe rabe. Ji bo vê jî lazim e tecrîdkirina Birêz Ocalan bi dawî bibe. Di vê mijarê de bi lez gav dikare bê avêtin û divê parêzer karibin biçin Îmraliyê."

**DIVÊ TIRKIYE JÎ JI SÛRIYEYÊ VEKIŞE**

Li ser biryara Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê (DYE) ya li ser vekişîna ji Sûriyê Temellî got, "Nêrîna me zelal û eşkere ye. Bila hemû hêzên derve ji Sûriyê vekişin. Bila DYE jî vekişe, Tirkiye jî Rûsya jî vekişin. Bi dîtina me, divê hemû hêzên derve vekişin, gelên Sûriyê li ser paşeroja xwe biryarê bidin."

Temellî diyar kir, ji bo dawî li lîstikên şer ên li Sûriyê bê anîn divê Neteweyên Yekbûyî tavilê li hev bicive û ji bo aştiyê helwestekê nîşan bide.

## Divê partiyên siyasî li hember êrîşan bibin yek



Siyasetmedarên Kurd diyar kirin ku divê tevgerên siyasî yên Kurd li tevahiya Kurdistanê helwesta xwe li hember gefên Tirkiyê bikin yek û ji bo lidarxistina kongreya neteweyî ya Kurdistanî bixebitin.

Sekreterê giştî yê Partiya Çepgir a Demokratîk Salih Gedo diyar kir ku gelek armancên Erdogan ji êrîşan li dijî herêmê hene. A yekemîn têkbirina biratiya gelan û jiyana hevpar a gelê herêmê ye.

Gedo tekez kir ku ne ji berjewendiya dewleta Tirk e ku pêkhateyên herêmê rêveberiyeke demokratîk ya li ser bingeha biratiya gelan û jiyana hevpar ava bikin.

Gedo wiha dewam kir: "Gefên Erdogan li ser herêmên ku ji terorê rizgar bûne, xetereyek e. Ji ber wê divê Koalîsyona Navdewletî bi erkên xwe rabe û bersiveke tund bide gefên Tirkiyê. Ji ber ku QSD, YPG û YPJ beşek ji koalîsyonê ne."

Gedo di dawiyê de bang li hemû tevgerên siyasî yên Kurdistanî kir ku li hember gefên Tirkiyê dengê xwe bikin yek û helwesteke cidî nîşan bidin."

Hevserokê Partiya Aştiya Demokratîk a Kurdistanê Telal Mihemed destnîşan kir ku ji destpêka aloziya Sûriyê ve Tirkiye dixwaze rê li ber her guhertineke demokratîk li Sûriyê bigire.

Telal Mihemed wiha got: "Gefên Tirkiyê ne tenê li dijî parçeyek Kurdistanê ye, lê belê li dijî tevahiya xaka Kurdistanê ye. Ji lewre divê tevgerên siyasî yên Kurd wek erkeke dîrokî li hember gefan bisekinin. Ji ber ku projeya dewleta Tirk, projeyeke mêtinger e, vegera Împaratoriya Osmaniyan û dagirkirina xaka dewletên cîran û bi taybet dagirkirina Kurdistanê armanca wê ye. Li gel van hemûyan lidarketina kongreya neteweyî ya Kurdistanî pêwîstiyek e."…*ANHA*



# Biryara DYE'yê wê bibe sedema kombûna DAIŞ'ê

**Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) derbarê daxuyaniya Serokê DYA'yê de ku diyar kiribû ew ê hêzên xwe ji herêmên rizgarkirî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişîne, daxuyaniyek da. QSD'ê diyar kir ku hê şerê li dijî DAIŞ'ê berdewam dike di vê demê de biryareke wiha wê bibe sedem ku DAIŞ careke din çalakiyên terorî li herêmê pêk bîne. QSD'ê da zanîn ku ku ev biryar wê bihêle ku gelên herêmê di nava pencên hêzên dijber de bimîne.**

Derbarê biryara serokê Amerîkayê de ku gotubû wê hêzên xwe ji herêmên rizgarkirî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişîne, QSD'ê daxuyaniyek da û diyar kir ku vekişîna hêzên Amerîkayê wê aramî û ewlehiya herêmê tevlihev bike û wê valatiyeke siyasî û leşkerî li herêmê ava bike.

Fermandariya Giştî ya Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) derbarê daxuyaniya Serokê DYA'yê de ku diyar kiribû ew ê hêzên xwe ji herêmên rizgarkirî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişîne, daxuyaniyek da.

Di daxuyaniyê de ev tişt hate gotin: "Di dema ku em şerekî dijwar li dijî çeteyên DAIŞ`ê di baregehên wan ên dawî de dimeşînin, her wiha em li herêmên rizgarkirî şaneyên veşartî ku dixwazin careke din xwe ji nû ve li herêmê ava bikin, tune dikin, biryara Qesra Spî ya ku tê diyar kirin wê xwe ji herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekişîne, wê bi awayekî neyînî bandorê li hemleya tunekirina terorê bike û di aliyê leşkerî de hêzê bide terorê û alîgirên wan ku bikaribin çalakiyên terorî li herêmê pêk bînin.

Em ji raya giştî re teqez dikin ku Şerê Tunekirina Terorê bi dawî nebûye. Heta niha dawî li hebûna DAIŞ`ê nehatiye. Lê belê ev pêvajoyeke pir girîng û hesas e. Dibe her kes xebatên xwe zêde bike. Alîkariyeke zêdetir ji koalîsyonê were girtin û bi hemû awayî alîkariya şervanan were kirin da ku şerê li dijî çeteyên DAIŞ`ê dewam bike û ne xwe ji herêmê vekişîne. Biryara vekişîna ji herêmê, wê tunebûna rêxistina terorî asteng bike. Her wiha wê pêşerojeke xeternak bi xwe re bîne. Wê heviyên gelê herêmê yên aramî û ewlehiyê pûç bibin. Ji ber ku heger rewşeke wiha de xwe ji herêmê vekişînin wê aramî û ewlehiya herêmê tevlihev bike. Wê valatiyeke siyasî û leşkerî li herêmê ava bike û gelê wê di nava pencên hêz û aliyên dijber de bimînin."




## Berdel giran be jî, wê azadî bi ser bikeve



Hevserokatiya TEV-DEM'ê têkilî gefên Tirkiyê yên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê daxuyanî da û got, berdêlê wê giran bin jî wê jiyana azad bi ser bixin.

TEV-DEM'ê li ser gefên dewleta Tirk a dagirker û daxuyaniya Serokê Emerîkayê Donald Trump ku diyar kiribû Wê hêzên xwe ji Sûriyê vekişînin daxuyaniyek da.

TEV-DEM'ê diyar kir ku herêmên di bin serweriya Rêveberiya Xweser de cihê aştî û aramiyê ne û wiha got: "Gelê Kurd, Ereb, Suryan û hemû gelên Bakurê Sûriyê bi berdêlên mezin sîstemek demokratîk ku azadiyê dike hedef ava kirin. Hê di rojên destpêkê de çeteyên dij mirovahiyê El Nusra, "Artêşa Azad", DAÎŞ û hevkarê wan dewleta Tirk dijminahiya vê sîstema demokratîk kirin û êrîş pêkanîn. Hêzên demokrat, tekoşînek mezin li hemberî van hêzên ku êrîşî tevahî cîhanê dikirin û komkujî pêktanîn dan û ew ber bi tunebûnê ve birin. Her çendî bajarên wek Kobanê ji binî ve hatin ruxandin jî, Hêzên Sûriya Demokratîk ku YPG'ê jî têde cihê xwe digire bûn afrênerên herêmên aram, aştiyane û cihê azadiyê."

**PIŞTÎ TÊKÇÛNA ÇETEYAN TIRKIYE KETE DEWRÊ**

TEV-DEM'ê daxuyaniya xwe wiha berdewam kir: "Dewleta Tirk ji bo çewisandina gelê Kurd, gelên herêmê û hêzên demokrat hemû alîkarî dan van çeteyên derveyî mirovahiyê. Lê dema ku dît çeteyan ev yek sernexist, vê carê ew bixwe ket dewrê. Dema ku hemû cîhanê QSD wek têkoşerên azadiya mirovahiyê îlan dikir, dewleta Tirk, ji bo armancên xwe û veşartina rûyê xwe yê rast QSD wek teror bi nav dikir. Li gel ku Tirkiyê her roj êrîşî sîstema demokratîk a li Bakurê Sûriyê dikir, hêzên demokrat ên ji bo azadiyê şer dikirin ji xwe re wek xeterî dida nîşan. Wisan ku, dema binketina DAÎŞ'ê bû mizgînî ji mirovahiyê re, ji Tirkiyê re berovajî bû. Ev binketin tehemûl nekir û daxuyaniya ku wê êrîşê gelê Bakurê Sûriyê bike."

Berdewamiya daxuyaniya TEV-DEM'ê wiha ye: "Piştî daxuyaniya dewleta Tirk ku dijminê demokrasî û Kurdan e ew ê êrîşî Bakurê Sûriyê bike, daxuyaniya DYA'yê ku ew ê bi 3,5 milyar dolaran fuze bifroşe Tirkiyê û heman rojê îlankirina ku leşkerên DYA'yê dê ji Bakurê Sûriyê vekişe jî nîşan dide ku li ser gelên Bakurê Sûriyê kompoyek e. Ev hemû geşedan gumana lîstok û planên qirêj zêdetir dike. Hemû cîhan ev yek bi awayê ku DYA ji Tirkiyê re gotiye em vedikişin, hûn dikarin dagir bikin şîrove kiriye.

**EM LI SER VEKOŞÎNA DYA'YÊ TI NIRXANDINÊ NAKIN**

Her dewletek û hêzeke siyasî ku biryarên der barê xwe de, ku bi nirxên mirovîn û exlaqî re ne bi nakok be bigire, rewşeke tê fêmkirin e. Bêguman biryara ku DYA'yê girtiye ji bo gelê DYA'yê û hemû mirovahiyê çiqasî rast e û biryarek bi xêrê ye yan na, mijareke wiha ye ku wê bê lêpirsînkirin. Mafên rayedarên DYA'yê heye ku biryarek weha bigirin; bes ku ev biryar li ser gelên mezlûm nebe parçeyekî planeke qirêj. Em weke avasaziyên demokratîk ên gelên Bakurê Sûriyê der barê vekişîna biryara DYA'yê de em ê tu nirxandinekê nekin; lewra ev biryar ya wan e. Jixwe em xwediyê têgihiştineke siyasî ne ku li Sûriyek demokratîk û azad tu hêzên derve divê nebin. Em ji vê bawer dikin ku di serî de Tirkiye divê hemû hêzên derve ji Sûriyê vekişin. Niha li hemberî demokratîkbûn û yekîtiya Sûriyê astengiya herî mezin dewleta Tirk e.

DYA dikare ji Sûriyê derkeve. Jixwe biryara vekişînê hatiye girtin. Encax gelên Bakurê Sûriyê ku di têkoşîna li dijî DAÎŞ'ê de ku ji deh hezaran zêdetir şehîd û bi deh hezaran birîndar dan di bin êrîşa dagirkirina dewleta Tirk de ne. Tevî ku tu êrîşên li hemberî Tirkiyê tune ne û êrîşî Bakurê Sûriyê dike li gorî qanûn û hiqûqa Neteweyên Yekbûyî sûcek e. Sûriye niha jî dewletek endamê Neteweyên Yekbûyî ye. Divê welatên endamên Konseya Neteweyên Yekbûyî divê bi lezgînî Neteweyên Yekbûyî vexwînin civînê û biryarek rê li ber êrîşkariya Tirkiyê bigirin derxînin.

**'BI BERDÊLÊN MEZIN JÎ BE WÊ JIYANA BIRÛMET BI SER KEVE**

Ev êrîş li ser bingeha dijminantiya demokrasî û Kurdan ji bo hilweşîna pergala demokratîk a li Bakurê Sûriyê avabûye ye. Di vê çarçoveyê de Ereb, Kurd, Suryanî û hemû gelên Sûriyê ku zêdetirî deh hezaran zarokên xwe şehîd dane xwe bispêrin hêza civaka demokratîk a rêxistinkirî û li dijî dagirkeriyê berxwedaneke dîrokî nîşan bidin. Di serî de gelên Bakurê Sûriyê ku yekîtiya Sûriyê di nava pergala xwe ya demokratîk de ava kiriye divê bibîne ku ev êrîş di serî de li dijî wê ye, li dijî vê êrîşê bi xurtkirina yekîtiya divê îradeya neteweya demokratîk ya têk naçe nîşan bidin. Bedelên wê giran be jî dema li ber xwe dan hebe ew ê jiyana bi rûmet û azad teqez bi ser bikeve."

## Divê modela li Rojava bê parastin



Li Parlementoya Îngîltereyê ji ber geşedanên li Rojava civîn hate lidarxistin. Di civînê de hate diyarkirin ku modela li wir a ku fikrên Ocalan dixe pratîke divê were parastin

Saziya bi navê Centre for Kurdîsh Progress a li Parlementoya Îngîltereyê derbarê geşedanên dawîn ên li Rojava civînek li dar xist.

Rojnameger Wladîmîr Van Wîlgenbûrg ê ku li herêmê xebitiye di civînê de axivî. Nûnerên siyasî yên aliyên cihê, hîndekarê Kîng's College Bîll Parl jî di nav de gelek akademîsyen û rojnameger tevlî civînê bûn.

**QSD'Ê MODELA PÊŞVERÛ XURTTIR KIR**

Rojnameger Wîlgenbûrg got ku, "Ligel ku li Bakurê Sûriyeyê kêşe hene jî, rewşa wê ya ji welatên cîranên wê baştir e. QSD a ku bi pêşengiya gelê Kurd têkoşîna xwe didomîne, modela herî pêşverû ya herêmê ava kiriye. Di warê mafê jinan,zarokan, olî û demokrasî de gelek pêşketin bi dest xistiye."

Wîlgenbûrg diyar kir ku biryara vekişandina DYE'yê ew ê dahatûya herêmê şolî bike.

**DIBE KU BERXWEDANÊN MEZIN PÊK WERE**

Wîlgenbûrg diyar kir dibe ku li herêmê koça penaberan dîsa were destpêkirin û li herêmê berxwedanên mezin pêk were.

**DIVÊ MODELA LI SER FIKRÊN OCALAN WERE PARASTIN**

Parlementer Lloyd Rûssel-Moyle jî bi bîr xist ku di Nîsana borî de ew çûbûn Rojava û geşedanên li herêmê wan bi çavê xwe dîtine. Moyle diyar kir hemû gavên ku li dijî modela ku li ser fikrên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan ew ê bêberpirsyartiyeke mezin be.

## Gefên dewleta Tirk xizmeta DAIŞ`ê dikin


Yek ji fermandarên Pêngava Bagera Cizîrê li Dêrazorê Zinar Awar destnîşan kir ku gefên dewleta Tirk a dagirker xizmeta terorîstan dikin, ji ber ku pêşketinên li dijî çeteyên DAIŞ`ê asteng dike û wiha got: "Heger em rastî êrîşan werin, em ê parastina axa xwe bikin."

Serokê rêjîma Tirk Erdogan diyar kir ku ew ê êrîşî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bikin.

Ji fermandarên QSD`ê Zinar Awaz destnîşan kir ku di dema ku şerê dijwar li dijî rêxistina terorîst a herî xeternak li cîhanê, serokê rêjîma Tirk Erdogan gefan li dijî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dixwe, gefên wî xizmeta terorîstan dikin, ji ber ku ew operasyonên li dijî rêxistina herî xeternak li dijî hemû mirovahiyê asteng dike.

Awaz destnîşan kir ku şervanên QSD`ê amade ne bersiva êrîşên li ser xaka xwe bidin û wiha got: "Em tu carî serê xwe ji dijminên xwe re natewînin. Me tu carî şerê Tirkiyê nekiriye. Em tu xetereyê li ser xaka wan çênakin. Lê belê heger tu êrîş li ser herêmên me pêk werin, em ê yekser bersivê bidin û parastina herêmên xwe bikin."

Zinar Awar di dawiyê de diyar kir ku armanca gefên dewleta Tirk a dagirker ew e ku morala şervanan bişikînin, her wiha destnîşan kir ku çalakiyên wan li dijî terorê didomin…*ANHA*